Koronavîrusa nû bi rêya têkiliya çerm an jî cilûbergan belav NABE



Koronavîrusa nû bi enfeksiyona dilopikê, wek mînak dilopika ji ber kuxînê, an jî bi têkiliya kesek tûşbûyî derbas dibe, ku hûn destê xwe li tişteke bi vîrus didin û piştre destê xwe li çavên xwe, dufina xwe an jî devê xwe didin. Vîrus lewre divê li gel membrana mûkos a we re bikeve nav têkiliyê beriya ku hûn tûşî wê bibin.

Koronavîrusa nû bi tenê bi rêya têkiliya çerm derbas nabe. Lewre, ji bo astengkirina tûşbûnê pêwîst nake hûn zarokê xwe bişon an jî hemû cilûbergên wî/wê bişon çi dema ku ji dibistanê an jî ji kreşê tê malê. Dîsa jî, divê hûn paqijiya baş a dest misoger bikin û dema hûn hatin malê divê hûn destê xwe û yê zarokê xwe bişon.